

Têmûrê Xelîl Mûradov

2-oy Perevlok Fû çika

Dom.7,k.8

ÊRÊVAN. 375078-USSR

Tel: 35.10.20 (mal)-52.97.41 (kar)

Nivîsîna Tîpa Latînî

**Edoyê Simkoyê Mikoyê Elîyê Dûmanê Kelboyê Omo,
xelkê Kela Makê ji Qezvînê**

03.09.2011

Nezerê Mêrxas

Divê navê merîkî belengaz dive, navê wî Nezer merîkî bêmerîfet û tembêl dive, xwe jî ewqas tirsonek, ewqas tirsonek, wekî tenê gavek jî ji cî nediliptî, herkê te wî bikuştta jî, sibê heta êvarê rex jina xwe rûdinişt, tev wê diçû derva, tev wê jî dihate mal. Bona wê yekê jî navê wî datînin Nezerê tirsonek.

Ev Nezerê tirsonek şevêkê tev jina xwe derdikeve ser şêmîkê, diçe derva. Çaxê ku derdikeve ber derî, dibîne wekî şeveke hîve xweşe, dibêje:

-Jinik, çi şeveke ber bazirgan birrînêye....

-Ez dibêm hema rabim, herim pêşîya wan bibrim, bînim mal tijî kim...

Jin dibêje.

-Dengê xwe bibire, cîyê xweda rûnê, tu li bazirgan birrîyê min binêre....

Nezer dibêje:

-Jina nes, tu çima nahêlî ez herrim pêşya bazirgan bibirim, talan kim, bînim mal tijî kim. Edî ez mêrê çi me, êdî çima ez kum datînim serê xwe, wekî tu dikî ber min xeber dî.

Ku gelekî şer dike, jinik dikeve malê derî dadide.

-Xwelî bikim serê teyî tirsonek, de naka here pêşîya bazirgan bibirre.

Eva nezerê me derva dimîne, ji tirsê zirav qetyayî dive. Çiqas jî teweqe dike, reca dike, wekî jin derî veke, çare nave, derî venake. Çara wî tê birrînê, diçe bin dîwarekîda diqincile, bi tirs û ricaf şev derbaz dike, hetanî sibe safî dibe.

Nezer bi xeyd bin berrojê dîwarê bi tev disekine, wekkî jina wî bê, wî bive mal û fikir dike. Roja havînêye germe, mêşêd nes, xwe jî ewqas tembele, wekî taqet nake pozê xwe temîzke.

Mêş jî tîn ser poz û lêvê wî rûdinên tijî dibin. Wextê ku gelekî êciz dikin, destê xwe hildibirre li rûyê xwe dixê. Çaxê ku li rûyê xwe dixê, mêşa dukuje, mêş li ber tijî divin.

-Wa... ev çîye.... Ecêb mayî dimîne dixwaze ku bijmire, wekî bi derbekê şend mêş kuşt, nikare. Fikrê dike, wekî ji hezarî kê m nîne. Wa... dibêje, e merekî wa bû me û heta îro min nizanbûye....Ez ku bi derbekê dikarim hezar serî bînber heywan bikujim, êdî çima rex evê hina bêkêr rûniştîme...

Ji vira radive hema rast diçe cem keşîşê gundê xwe.

-Keşîş, xwedê xweyî ke.

-Xwedê te xweyî ke, lawo

-Keşîş, lê tu navêjî tiştêkî wa qewimî.

Mêrxasîya xwe şirove dike û pêra jî melûmetîyê dide, wekî wê ji jina xwe dûr keve, tenê reca dike, wekî keşîş mêrxasîya wî binivîse, wekî inda nebe, gişk jî bixûnin pê bihesin. Keşîş jî bona laqirdî ser pînekî dinivîse:

-Nezerê mêrxas, ne altbûyî, ku yek lêxe, hezar dukuje.

Û dide wî. nezerê me jî ew pîne ser darekî qewîn dike, şûrekî jeng bûyî jî piştî xwe girêdide, kerê cînara xwe sîyar dive û ji gund diçe.

II

Ji gundê xwe derdikeve, rêk dide ber xwe û diçe. Xwe jî nizane ev rê kuda diçe.

Diçe û diçe, carekê jî paşda dinhêre, dibîne ku ji gund dût ketîye. Hema vira jî tirs dikeve dilê wî. bona ku dil bide xwe, bin pozê xweda dike ginengin, distirê, xwe bi xwera xeber dide, ser kerê hêrs dive. Çiqas diçe dût, ewqas jî tirsê wî zêde dive, çiqas ku tirsê wî zêde dive, dengê xwe aqas bilind dike, qarreqarr, qajeqaj hewar û gazî dike, pêra jî ker dike zirre zirr...ji vê qarre-qarrê û qîrînê teyrê ser darêd nêzîk difirrin, kêwrîşk ji bin belga dirrevin, beq jî ji hêşînayê xwe davêjin avê...

Nezer dengê xwe diha bilind dike û sevdaserî dibe.

Lê çaxê ku dikeve nav mêşê , -wî tirê wekî ji bin her darekî, ji bin her belgekî, ji pişt her kevirekî, wê niha cenewir yan qaçax hucum kin ser, ji tirsê dike qîrre qîrr, usa dike qîrre qîr, bira nekeve guhê te.

Tu nebêje hema evî wextî gundîk nişkêva hesp dikişand û mêşeda dihat. Eva dengê ecêb çewa ku dikeve guhê wî, disekine.

-Wa, dibêje, ez jî gihîştîme vira unda bim? Heye tune vana cardin....

Hespê xwe dihêle, dikeve mêşê bintara rê, du lingê wî hebûn, dudu jî deyn dike û dirreve.

Bextê te hez kim Nezer mêrxas, bi qarre qarr tê dibîne hespeke zîn kirî orta rê sekinîye bona wî. ji kerê peya dibe, ewê hespa zînkirî rûdinê û dîsa di rîya xweda diçe.

III

Zef diçe, hindik dice, dighêje gundekî, xwe, nenasî gund, gund jî nenasî wî. kuda herre, kuda neçe. Ji malekê dengê zurnê dibhê, hesp dajo ber bi wî dengî, diçe dikeve maleke dewatê.

-Roja we xêr!

-Xêr, sersera, ser çeva! Tu xêr hatî ser sera hatî.

Kerem kin, kerem kin, mêvan mêvanê xwedê ye, evî bi beyraqa xweva dibin serê textey jorin didin rûniştandinê, çevê te li xweşîyê be, êdî çi tu bêjî tijî ber dikin, herçêk xwerin, herçê vexwerin. Dewatvan dipirsin dixwezin bizanibin, ku kîye ev mervê ecêbî nenas yekî serê jêrinda rûniştî, yê kêleka xwe rûniştî dev dide û jê dipirse: eva jî yê rex xwe rûniştî dev dide, wa bi sirê hev dev danêva û pirskirinêva şixul dighêje keşîşê serê jorinî rûniştî.

Keşîş bi teherekî nivîsara ser beyraqa mêvanê nenas dixûne:

Nezerê mêrxasî, ne alt bûyî. Ku yek lêxe, hezar dikuje.

Dixûne û xof girtî yê kêleka xweyî rûniştîra dibêje. Eva ji yê kêleka xweyî rûniştîrra dibêje, eva jî yê sisya dibêje, yê sisya jî yê çararra dibêje, wa gilî dighêje hetanî bintarê derê û mala dewatê dike gimîn, lê tu nabêjî mêvanê teze bi xwe, Nezerê mêrxase ne altbûyî.

Ku yek lêxe, heazr dikuje.

-Wa, Nezerê mêrxas... merîkî pesnê xwe dayî, dike gazî, çiqas hatîye guhastinê, min carekêva nas nekir... û merîyê usa jî peyda dibin, yê ku mêrxasya û kirinêd wî şurove dikin, usa jî nasbûna xwe berê û rojêd tev derbaz kirî.

Lê çima, bi mervê usarra tu xulam pêrra tunnene, bi ecêbmatî merîyêd nenas dipirsin.

-Edetê wî usane hiz nake bi xulamava bigerre. Carekê min jê pirsî, got ezê xulam çi bikim? Dinya xulamê minin, tenê xulamê minin.

-Lê çima, şûrekî wî qeydetî tunne, eva hesinê jeng girtî piştî xweva girêdaye.

-Merîfet jî hema di wî da ne, wekî bi evî parçê hesinê jeng girtîva yek lêxî, hezar bikujî, yanê na bi şûrê başva, çi heye ku? Egîte mayîn jî dikujin.

Û cimaet jî şaş bûyî ser pîya disekine eşqa Nezerê mêrxas vedixwe. Merivê nav wanda terbet jî, radipe pêşberî Nezer xeber dide, dibêje, me zûva bihîstibû navê teyî mezin, em hesreta dîtinya te bûn û wa îro em bextewarin, ku em te dibînin cêrgê xweda. Nezer dike kizîn û destê xwe dihejîne. Cimaetvan jî bi sîyanet çev dikine hev, fem dikin, wekî ev kizîn û hejandina dest, çiqas tişt nîşan dide. Aşiq jî, ku wêderê bû, pêrra-pêrra kilam diefirrîne û distrê.

Tu xêr hatî, tu ser çeva hatî,

Teyrê sîmirî cîyayê me,

Tac û pesnê dinya me

Nezerê mêrxasî ne altbûyî,

Ku yek lê dixî, hezar dikujî.

Tu gumana belengaza,

Tu wana aza dikî ji her derda,

Tuyê me azakî ji neheqa

Nezerê mêrxasî nealtbûyî,

Ku yek lê dixî, hezar dikujî.

Em qurbana beyraqa te ne,

Şûra pişta te, kumeyta bin te,

Lingê wê, poçik, rewşa wê,

Nezerê mêrxasî nealtbûyî

Ku yek lêdixî, hezar dikujî.

Û dewatvanê serxweş belayî

Her cîya dikin, wekî tê,

Nezerê mêrxasî nealtbûyî,

Ku yekê lêxe, hezar dikuje.

Derheqa mêrxasîyê wîye ecêbda şurove dikin, û herdera navê ziyarêd xwe teze bûyî datînin, nezerê mêrxas. Nezer ji mala dewatê dertê û di rîya xweda diçe. Diçe dighîje deşteke çayîr çîman. Hespa xwe evê deşta çayîr-çîmanda berdide diçêre.

Beyraqa xwe dinikîne, xwe jî bin sîya beyraqêda vedileze radizê. Tu nebêjî hevt birê dêw hene, hevt cerdebaşî, ev cîyana jî yê wanin, koçik sera wan jî li serê çîyayê nêzîke. Ev dêwana jorda dinhêrin, dibînin, wekî merîk hatîye deşta wanda peya bûye. Gelekî ecêbmayî dimînin, ku ewî çewa dil kirîye, çend serîye, ku bêtirs hatîye nav kewşenê wanda rihet peya bûye û hesp jî berdaye diçêre. Her gurzekî wanî çil lîtrî hebû, ewana gurzêd xwe çil lîtrî hiltînin û tèn. Tèn çî dibînin, wa hespek diçêre merîk jî kêlekê razayî, li serê wî jî beyraqek çikandî, ser beyraqê jî nivîsî:

Nezerê mêrxasî nealtbûyî,

Ku yek lêdixe, hezar dikuje.

-Weyî, Nezerê mêrxase...dêw tilîyêd xwe digezin û cîyê xweda sar bûyî disekin.

Tu nebêje gilyê dewatvanê serxeş gihîştşye wana jî. Wa tûka wana devê wanda

miçiqî, ewana zîya bûyî disekinî, hetanî ku Nezer xewa xwe distîne û hişyar dibe, çaxê ku hişyar dibe, çevê xwe vedike, divîne hevt dêwê bira gurzêd çil lîtrî ser milla li ber serê wî sekinîne, êdî zikê wîda taqet namîne. Derbazî pişt beyraqa xwe dibe û diricife, çewa ku belgê payîzê diheje. Çaxê ku ev dêw dibînin, ku ewî reng avîti diricife. Wana tirê ku hêrs bû, niha çewa jî bive, wê bi derbekê wan hevta jî bikuje, ber wî vedilezin ser erdê û jê reca dikin.

-Nezerê mêrxasî nealtbûyî, ku yek lêdixî, hezar dikuji

-Me navê teyî egît bihîstibû, em hesreta dîtinya te bûn, em naka bextewarin, ku tu bi lingê xwe hatîyî erdê me, em xulamê te ne, em hevt birane, wa koşk sera, me jî serê çîyayê hane, xûşka me ye bedew jî têda ne. Em hîvî dikin, tu layîq bibînî bêyî nanê me bibirî...vira bîna Nezîrê me tê ber, hespa xwe sîyar dibe, ewana jî beyraq hildidin, dikevin pêşîyê û bi sîyanet û hurmet dibin koşk û sera xwe.

Dibin koşk sera xweda mîna padşa jêra hurmet dikin û ewqas dereqa mêrxasîya wî da xeber didin, ewqas pesnê wî didin, wekî dilê xûşka wane bedew dikeve Nezer, çî soz ku hurmet û sîyanet jî pêrra zêde dibe.

V

Evî wextîda pilingek peyda dibe û ewî welatîda tirs û xof dike dilê gişka. Kî wê pilingê bikuje, kî wê nekuje, helbet ku Nezerê mêrxas wê bikuje. Êdî kî wê dil bike herre pêşya piling. Gişk li rûyê Nezer dinhêrrin, jorê xwedêk, jêrê Nezerekî mêrxas.

Çaxê Nezer navê piling dibhê, ji tirsê dirreve direve, dixaze birreve, herre mala xwe, lê mervê sekinî fikir kirin wekî dirreve ku herre piling bikuje. Dergistya wî dide sekinandinê tu bê sîlah, bêting kuda dibezî, sîlihê xwe hilde, paşê herre.

Sîliha wî tîne dide wî, wekî herre ser hurmeta xwe mêrxasîk jî zêde ke. Nezer sileh hildide û derdikeve diçe. Diçe mêşe bilindî ser darekî dibe, ser dar xwe vedişêrre, wekî ne ew rastî piling bê, ne pilinp rastî wî bê. Ser dar diqincile, êdî kî wê Nezer bivîne, ruhê wî, bîye hebê garis. Hema pilingê bêxweyî jî tê bin evî darîda vedileze. Çaxê ku Nezer piling dibîne-ziravê wî dibe av, ber çevê wî reş dibe, dest û pîyê wî sist dibin û bi gimîn ji ser dar dikeve ser pişta piling. Piling tirsayî ji cî banzdide.

Nezer jî ji tirsaxwe ser pişta piling xwe qewîn digre. Wa bi tirs û xof, zirav qetyayî, Nezer ser pişta piling zeliqyayî, piling jî direve çewa dirreve, çewa dirrevw, êdî çîya û banî, çol û deşt, kevir û zinar napirse. Merî nişkêva dibînin, wa Nezerê mêrxas piling sîyar bûyî dajo.

-Hewar, ha hewar, werin ha werin, Nezerê mêrxas piling kirye hespa xwe sîyar bûye dajo....Lêxin, wa lêxin....gişk jî dilê xwe bi her alîyaba qewîn dikan, bi qîrîn qurrîn, bi hirrehirr hucum dikan, bi qeme bi şûr, bi tiving, bi kevir û bi dar lêdixin dikujin.

Çaxê ku hişê Nezer serda tê, zimanê wî, vedibe, -dibêje, heyf we çima kuşt, bi zorr min ew kiribû hesp û lê sîyar bûbûm....Minê aqas bajota.....

Xeber diçe digihîje koşk serayê. Mêr û jin, mezin û piçûk, mexluqet derdikevin derva bona hurmeta Nezer. Ser Nezer kilam derdixin û distrên:

Di vê dinyê

Li cerga merya

Kî dikare bive angorî te

Tu Nezerê Mêrxas.

Çewa teyrê simir, çewa birûsk û agir

Ji kela bilind firî hatî

Tu Nezerê Mêrxas.

Piling cenewir

Te kir hespê xwe

Tu sîyar bûyî çîya bi çîya

Tu Nezerê Mêrxas

Te me aza kir,

Te xilas kir

Sîyanet te ra esr û zeman,

Tu Nezerê Mêrxas

Û Nezerê mêrxas bi xûşka bedewe dêwava zewicandin. Heft roj, heft şev dewet kirin.

Bi kulam pesnê, xatûnê dan.

-Hîv derket çîyê.

Ew mîna kê bû?

-Hîv derket çîyê,

Ew Nezer Mêrxas bû.

-Tev teze şewq veda,

Ew mîna kê bû?

Tev teze, şewq veda,

Ew xanim xatûn bû?

Padşayê me sor bû.

Teva wî jî sor bû.

Tac jî sor, wa sor bû,

Kinc jî sor bû, wa sor bû,

Piştok sor bû, wa sor bû,

Konder sor bû, wa sor bû,

Xatûn sor bû, wa sor bû,

Xatûna sorra selam

Padşayê sorra emr û tev.

Bimbarek be, bimbarek,

Nezerê Mêrxas bimbarek

Xatûna nazik bimbarek,

Dinyayê tamamra bimbarek.

VI

Tu nebêje, padşayê cînarê welatê wan, evê qîzîkê xwestibû. Çaxê ku dibhê qîz nedane wî, dane yekî dinê, esker berev dike, tê ser hevt bira şerr. Ev hevt dêw diçin cem Nezerê Mêrxas, gilîyê şerr elamî wî dîkin, serê xwe ber wî nimz dîkin, disekinin emr jê dixwezin.

Nezerê Mêrxas wextê ku dengê şerr dibhê, ditirse û diricife, derdikeve derva, ku birreve herre gundê xwe. Merîya jî zanbû, wekî dixweze pêra pêra derkeve hucum

ke ser ordîya dijmin. Dikevin ber lingê wî, digrin û jê teweqe dikin, dibêjin tuyê bêçek, bêsilêh, tuyê tenê kuda herrî? Tu çi dikî, te ji xwe dest kişandîye, çi behse?

Çek û silêh tînin didin Nezerê Mêrxas, jin jî ji birêd xwe reca dike, wekî nehêlin Nezerê Mêrxas ji mêrxasîya xwe kubar bûyî, tenê hucum ke ser ordîya dijmin. Ev elametî diçe dighîje ordîyê û mexluqetê, cesûs jî ev gilê dighînin dijmin, ku Nezerê Mêrxas bê silêh, bêçek difirya ber bi deşta şêrr, ancax karibûne zeftkin û dorgirtî tînin...

Hespeke kehêl tînin deşta şêrr, ku Nezer sîyar be. Esker jî pêra eşq bûyî bi qalmeke giran pêrra gazî dike:

-Xweşbe Nezerê Mêrxas.....mirin dijminra.

Kihêla Nezer ku dibîne ser pişta yekî bêkêr rûniştîye dike hirre hirr, serê xwe hildibirre û difirre ber bi pêş, hema rast ber bi ordîya dijmin diçe. Esker jî tirê Nezerê Mêrxas dest bi hucumê kir, dûrre gazî dikin, xwe jî hucum dikin, mîna birûskê xwe digihînin dijmin. Nezer ku-dibîne nikare dizgîna hespê xweyîke, hindik dimîne jê bikeve, destê xwe davêje, dixweze xwe darekîva bigre, lê tu nebêje, dar rizyayîye, çiqlekî qasî kêranekî dişkê û destê Nezerda dimîne. Ordîya dijmin, ya ku berêva nav dengê Nezer, bihîstibûn û dilê wan tirsêva tijî bû, ev yek jî ku bi çevê xweva dibînin, êdî çokê wanda qudûm namîne, berê xwe diguhêzin, - birreve, de birreve, herkê ku mêre, serê xwe aza ke, ku Nezerê Mêrxas dara bi kokêva radike û tê....

Wê rojê ji dijmin çiqas bêjî tên kuştinê, yêd mayîn şûrêd xwe datînin bin lingê Nezerê Mêrxas elam dikin teslîmbûna xwe û altbûna xwe. Ê Nezerê Mêrxas bi egîfî ji deşta şêrr vedigere tê kela dêwa. Mexluqet ser rîya wî eşq û şabûneke giran hazir dike, bi ûrre, bi gazî, bi dest li hevexistin, kulma û def û zurnêva, bi qîz û gulavê, bi wekîlava û xeberdanava tên pêşya Nezerê Mêrxas, sîyanet û hurmeteke

usa eyan dikin, wekî Nezer ecêb mayî, şaşbûyî dimîne. Bi hurmet û sîyanet Nezer tînin elam dikin paşê xwe, dibin ser textê padşê didin rûniştandinê.

Nezerê Mêrxas dibe padşe, wan dêwarra jî, her yekîrra qullixek dide. Nişkêva divîne, ku dinya tamam destê wî da ne.

Dibêjin ku hetta roja îroyîn jî Nezerê Mêrxas hê dijî û padşetîyê dike. Û çaxê ku derheqa egîtîyêda aqilda, bilyantîyêda cem wî xeber didin, Nezer dikene û dibêje:

Çi egîtî, çi aqil, çi bilyantî, gişk jî xeberê valane, şixul ewe, wekî bextê merya hebe, bextê te heye, kêf bike...û dibêjin, wekî Nezerê Mîerxas heyani îro jî kêf dike û ser dinyayê dikene.

Qîmet 80 K.

Şikilkirîye M.ARÛTÇÎYANÎYAN

Tercime kir: CASIMÊ CELÎL

Rêdaktorî kir: EMÎNÊ EVDAL

Rêdaktorê vîmîê û têxnîkîyê: E. DANÇO

Temiz kir: R. DIRAMBYAN

Neşir N_o 3905 tembê N_o 178

Glavlit N_o 2259 tîraj 1000

Nivîsîn bi tîpa latîniyê:

Edoyê Simkoyê Mikoyê Elîyê Dûmanê Kelboyê Omo
xelkê kela Makê ji Qezvînê

05-09-2011